

ETÎMOLOJIYA CÎNAVKA VEGEROK “XWE”

Ali Husein Kerim

Beriya ku behsa jêza û jêderka peyva “xwe” bête kirin, çêtire mirov hinekî behsa cinavka vegerok bike.

Cînavka vegerok, têkildarî û wateyê weldigerine li ser çalakdar. Di gel cinavkên asayî (ez, tu, ew, em, hûn, ew) û yên tewandî (min, te, wî/wê, me, we, wan) tê bikarînan. Ji bo hîkar vegere li ser kirde cinavka vegerok “xwe” bikartînin.

Şêwazên cinavka vegerok “xwe” yên mêrza-nêza, tekjimar-pirjimar nînin. Rola xwe ya mobîl ango bizavî heye û angoreyî diyarkirina kes an jî kesan têtîniyeke ji ber xwe ve destnîşan dibe.

Angoreyî kêşana cinavkan, cinavka vegerok “xwe”:

kurdî	tirkî	îngilîzî
<i>ez xwe</i>	ben kendim	myself
<i>tu xwe</i>	sen kendin	yourself
<i>ew xwe</i>	o kendisi	himself, herself, itself
<i>em xwe</i>	biz kendimiz	ourselves
<i>hûn xwe</i>	siz kendiniz	yourself
<i>ew xwe</i>	onlar kendileri	themselves

kurdî	tirkî	îngilîzî
<i>min xwe</i>	ben kendim	myself
<i>te xwe</i>	sen kendin	yourself
<i>wî xwe</i> <i>wê xwe</i> -----	o kendisi	himself herself itself ¹
<i>me xwe</i>	biz kendimiz	ourselves
<i>we xwe</i>	siz kendiniz	yourself

¹ Di îngilîzî de jib o heyber û ajalan destnîşan bikin, cinavka it bi kar tînin. Ev di kurdî de nîne.

<i>wan xwe</i>	onlar kendileri	themselves
----------------	--------------------	------------

Şêwazê bikaranîna cinavka wegerok “xwe”:

- Çalakiyê vedigerîne li ser kirde. Yanê hîkarê vedigerîne li ser kesê ku kar û livbazê pêkhaniye.

Bavo destên xwe şuşt (yê ku destê xwe şuştîye bavo ye)
Azad zimanê xwe gezkir. (yê ku zimanê xwe gezkirîye Azad e)

- Erka pihêtkirinê cîbecî dike.

Bila ew bi xwe bêje (erka wî pihêt dike)
Sibê ez bi xwe vedibêjim. (Erka xwe ya sibê pihêt dike)

Di mînakên jor de jî diyar e, dema ku cinavkên asayî û yên tewandî kirde ne, cinavka wegerok hertim bireser e.

JÊDERKA CÎNAVKA VEGEROK “XWE

Proto-Hînd-Ewropî **se-* ‘xwe, cewher’², **s(w)e-* ‘kendi’³, Avesta *hva-*, *hava-* ‘xwe, Hîndiya kevnar *sva* ‘xwe, Tokharian A *şn yi* ‘xwe’⁴, Latinî *sé* ‘xwe’⁵, Slavkiya dêrê ya kevnar *se*, ‘xwe’⁶, Prusakiya kevnar *sien* ‘xwe, cewher’, Letonî *sevi* ‘xwe, Eston *ise*, Almaniya kevn ya jorîn *sih*⁷, Gotî *sik* ‘xwe’, Galî *hunan*, Çekiyakî *ja*, Pencabî *savai*, Peştûnî *han*, Fransû *soi*, Erebî *xas*⁸, Farisî *xod*, Kurdî *xwe*.

Belê, “xwe” cinaveke Proto-Hînd-Ewropî ye û ji Proto-Hînd-Îranî derbasî li nav zimanê kurdî bûye.

² Julius Pokorny, Indogermanisches etymologisches Wörterbuch. 882-84, Bern-Munich 1959

³ Watkins, Calvert. The American Heritage Dictionary of Indo-European Roots. (2nd edition) 87-88 Boston: Houghton Mifflin. ; Fortson 2004

⁴ Winter, Werner, Tocharian. In Ramat 1998

⁵ Tucker, T. G. A Concise Etymological Dictionary of Latin. Halle (Saale): Max Niemeyer Verlag, 1931.

⁶ Trubačev, Oleg. Etimologičeskij slovar’ slavjanskix jazykov. Moskva: Nauka. 1974

⁷ Howe, Stephen, The Personal Pronouns in the Germanic Languages. 1996, Berlin, New York: Walter de Gruyter.

⁸ Dema ku bala xwe didine tê zanîn ku peyva *xas* (خاص) a erebî û kurdî *xwe/xwed* û farisî *xod* wek hev in. Diyare peyva *xas* (خاص) ji derve ketiye li nav erebî.